Li dijî hemû kurdan îlana şer e

Dewleta tirk di şexsê Rojava de gef li hemû kurdan dixwe. Li Rojava seferberî hatiye ragihandin û gel bi biryar e ku li dijî êrîşan xwe biparêze

DEWLETA TIRK gefên dagirkeriyê li bakurê Sûriyeyê û Rojava dixwe û li hemberî gefan bertek zêde dibin. Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan got ku gefên Erdogan, li dijî hemû kurdan îlana şer e. Gel li ser sînorê Serêkaniyê li hemberî dagirkeriyê çalakî li dar xist. Meclisa Sûriyeya Demokratîk xwest qada hewayî ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji balafiran re were qedexekirin.

HEVSEROKÊ Komîteya Têkiliyên Dîplomatîk a PYD'ê Salih Muslim biryara DYA'yê ya vekişîna ji Sûriyeyê nirxand. Salih Muslim da zanîn ku wan tu caran ji tu hêzan re negotiye ; 'Werin welatê me biparêzin an jî me negotiye ji vir her in'. Muslim destnîşan kir ku ew bi biryar in ku li hemberî hemû êrîşên dewleta tirk parastineke tevahî pêk bînin... *RÛPEL - 3*

@rojname

22 Kanûn - Şemî 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 213

Derew bi ser nakevin

Dê gelên Kurdistan û Tirkiyeyê di hilbijartinên herêmî yên adara 2019'an de biçin ser sindoqan û tercîhên xwe bikin. Lê mercên hilbijartinên herêmî yên 2019'an, ji hilbijatrtinên 2009 û 2014'an cudatir in. Gel berê jî li dengê xwe xwedî derketibû; li hemberî encamên ku bi hîle û lîstikan derxistinbûn nepejirandibûn û bi vê nehiştibûn ku derewên wan bi ser bikevin... *Nivîsa Cûmalî Dogan / R.3*

Komên nû dikevin grevê

KET ROJA 45'EMÎN

- Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 45 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Guven li girtîgehê peyam şand û got ku dê teqez bi ser bikevin. Her wiha li 10 girtîgehan 42 girtiyên siyasî li dijî tercîdê hefteyek e di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne. Li aliyê din li girtîgehan greva birçîbûnê ya dorveger jî dewam dike.

ÇALAKÎ ZÊDE DIBIN

- Denîz Kaya li ser navê girtiyên ji doza PKK'ê û PAJK'ê yên li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê daxuyanî da û got ku koma duyemîn dê di 26'ê kanûnê de li 5 girtîgehan û koma sêyemîn jî dê di 5'ê çile de li 7 girtîgehan dest bi çalakiya bêdem û bêdorveger bikin. Girtiyên PAJK'ê yên li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê gotin heta ku tecrîd rabe dê çalakî bidomin... *RÛPEL - 3*

Operasyona wekî film!

Çapemeniya tirk di serwîskirina nûçeyên derew de tu sînoran nas nake. Ajansa Nûçeyan a Demîroren (DHA) dîmenên belgefîlma Bakur a ku ji aliyê Çayan Demîrel û Ertugrul Mavîoglu ve hatibû kişandin wekî 'dîmenên operasyonê' ragihand û çapemeniya tirk ev nûçe belav kir.

Li Başûr grev dewam dikin

Çalakiya greva birçîbûnê ya ku bi pêşengiya nûnertiya HDP'ê ya Hewlêrê hatiye destpêkirin, di roja 32'yemîn de ji aliyê koma 17'emîn ve didome. Li Silêmaniyê jî grevên birçîbûnê dewam dikin. Li Silêmaniyê komeke ku xwestin bi meşekê tecrîda li ser Ocalan şermezar bike ji aliyê asayîşê ve hatin binçavkirin. Komeleya Karkerên Mezopotamyayê ragihand ku 10 endamên wan hatine binçavkirin... *R.3*

Di tifaqê de li hev kirin

Hevdîtinên ji bo tifaqa hilbijartinên herêmî yên partiyên kurd bi ser ketin û tifaq pêk hat. Parlamenterê HDP'ê Îmam Taşçier têkildarî mijarê got ku bi partiyên tev li hevdîtinan bûne re li hev kirine û di demeke nêz de bi awayekî fermî dê tifaqa xwe ragihînin... *RÛPEL - 3*

JIN

Çeteyên DAIŞ'ê li Fasê 2 jin qetil kirin

RÛPEL - 2

CÎHAN

Wezîrê Parastinê yê DYA'yê Mattîs îstifa kir

RÛPEL - 4

KIRMANCKÎ

Qala 35 serrê xo yê mîyanê çar dêsan kerd

RÛPEL - 5

Dîrok tê revandin

Navçeya Heskîf a Êlihê yek ji wargehên herî kevn ên cîhanê ye ku xwedî dîrokeke 12 hezar salan e. Heskîfê malovaniya gelek şaristaniyan kiriye. Heskîf ku di herikîna dîrokê de bi gelek navan hatiye naskirin, şopên gelek şaristaniyên ku ji wan re malovanî kiriye hene. Li ev bajarê kevnar, 550 qadên arkeolojîk hene. Herî dawî Mizgefta Eyyubî ku xwedî dîrokeke 630 salan e, li Heskîfê ber bi cihê wê yê nû ve hate veguhastin. Dema mizgeft dihat veguhastin, welatiyên Heskîfê jî bi xemgînî lê temaşe kirin. Welatiyên herêmê jî bertek nîşan dan û gotin ku dîroka wan tê revandin.

Li Başûr dijberiya navenda çandê

Hêzên Asayîşa Kelarê ketin avahiya Navenda Çand û Hunerê ya Nîwegerê, xwestin saziyê bigirin û tabelayê daxînin. Xebatkarên saziyê gotin ku belgeyên wan ên fermî temam in, hêzên asayîşê gotin, "Rast e belgeyên we hene, lê biryar hatiye dayîn ku divê ev sazî were girtin."

www.arsivnuhi.org

Li Ewropayê xelat, li Tirkiyeyê fezleke!

ENQERE - Serdozgeriya Komarê ya Amedê, der barê parlamentera HDP'ê ya Êlihê Feleknas Uca de bi hinceta di 26'ê cotmeha 2016'an de beşdarî çalakiya şermezarkirina binçavkirina Hevşaredarên Bajarê mezin a Amedê Gultan Kişanak û Firat Anli bû de piştî du salan fezleke amade kir û ji 6 salan heya 9 salan cezayê girtîgehê ji Uca re xwest. Serdozger di çarçoveya îdianemaya amade kir de, bi daxwaza rakirina destnedayîna Uca ji meclisê re fezleke şand. Çalakiya weke sûc hatiye dîtin û bûye sedem ku fezleke der barê Uca de bê amadekirin, weneyekî Uca yê di çalakiyê de hatibû kişandan, layîqî Xelata Jinan a Rûmetê ya Clara Zetkin hatibû dîtin.

Xwe li dengê Leylayê bigirin

Çalakiya greva birçîbûnê ya Leyla Guven di roja 45'an de didome. Jinên Colemêrgê piştgirî dan çalakiya Guven û destnîşan kirin ku divê hemû jin bi çalakiyên xwe xwe li dengê Guven bigirin û bibin dengê wê

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger ku hevseroka KCD û parlamentera HDP'ê ya Colemergê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin ket roja 45'an. Li her derên Kurdistan û Tirkiyeyê ji bo çalakiya Guven piştgirî berdewam dikin. Jinên Colemêrgê jî bertek nîşanî helwesta hikûmetê dan û bang li hemû jinan kirin ku deng bidin dengê Leyla Gûven.

Jina bi navê Hediye Koç anî ziman ku daxwaza Guven daxwaza hemû jinan e û diyar kir ku divê hikûmet bi lez gav biavêje û wiha axivî; "Em dixwazin parlementera me bê berdan. Ev 45 roj in bi ruhekî berxwedêr di bin siya zilmê de bedena xwe li dijî tecrîdê kiriye mertal. Daxwaza Guven daxwaza bi milyonan e. Hikûmet li dijî çalakiya Leylayê bêdengiya xwe didomîne. Em vê helwesta hikûmetê qebûl nakin. Rewşa Leylayê roj bi roj xerab dibe. Divê jin rabin ser pêyan û ji dengê Leylayê re bibin deng."

Divê tecrîd bi dawî bibe

Di heman mijarê de Gulê Polat destnîşan kir ku divê civak li dijî tecrîdê dengê xwe bilindtir bike û wiha got: "Leyla Guven vîna me ye. Divê gelê me ji Leylayê re bibe deng. Em heta dawiyê piştgiriyê didin Leylayê. Divê bi lez tecrîdê bi dawî bikin. Dengê Leylayê bilind bikin tecrîdê bişikînin."

Guven cesaret da jinan

Her wiha Emîne Atak jî daxuyand ku Guven li dijî zilma li ser gel bûye mertal û ev tişt anî ziman: "Pêwîst e gelê hurd hemû bi hev re ji çalakiya Leylayê re bibe deng. Ger hikûmet vê helwesta xwe berdewam bike ew ê mezin bibe. Em wekî jinên Colemêrgê piştgiriyê didin Leylayê. Daxwaza Leylayê daxwaza hemû jinên kurd û kurdistanê ye. Çalakiya Leylayê cesaret da hemû jinan û di vê çalakiya xwe de serkeftina herî mezin ji gelê me re anî. Çalakiya Leylayê baweriya serkeftinê ye." *COLEMÊRG*

Divê gelên Sûriyeyê li dijî dagirkeriyê bibin yek

Gefên Erdogan ên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyeyê didomin. Têkildarî mijarê jinên asûr û suryan axivîn û gotin ku têkoşîna wan a li dijî dagirkeran dê bidome.

Endama Rêveberiya Parastina Xabûrê Madlên Xemîs anî ziman ku dewleta tirk bi hinceta dê terorê biqedîne êrîşê Rojava dike û wiha got: "Lê hemû cîhan dizane ku yên piştgiriyê dide çete û terorên wekî DAIŞ û OSO'yê dewleta tirk e. Erdogan ji HSD'ê re dibêje terorîst lê yên ku li dijî DAIŞ'ê têkoşîna herî mezin kir jî HSD'ê ye. Erdogan ji bo êrîşa xwe rewa bike navê terorê li hêzên ku gel û azadiyê diparêze dike. Lê em ê wekî Hêzên Parastina Xabûrê yên aşûrî li dijî zîhniyeta dagirker a dewleta tirk derkevin. Li dijî dagirkeran em çong danaynin."

'Divê dîroka qirkirinê dubare nebe'

Endama Rêveberiya Hêzên Naturo Sîlda Sîmon da zanîn ku di dîroka Osmaniyan de her dem qirkirin pê hatiye û Erdogan dixwaze vê dîrokê bidomîne û wiha axivî: "Divê dîroka qirkirinê dubare nebe. Dîrok bûye şahidê gelek komkujî û qirkirinên wekî yên Sêfo, Sîmêl, Nînewa, Xabûr, Kobanê. Dewleta tirk niha dixwaze di bin navê olperestiyê de qirkirin û komkujiyên nû pêk bîne. Divê li dijî vê yekê em hemû gelên li Sûriyeyê bibin yek."

Têkoşîn dê bidome

Her wiha endama Beşa Ekolojiyê ya Şaredariya Hesekê Zibirta Iskender Şemûn jî ev tişt anî ziman: "Pêwîst e rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî û hêzên demokratîk ên navneteweyî nebin hevkarên komkujiyên ku li ser gelên li Sûriyeyê tên kirin. Divê helwestek zelal li dijî gefên Erdogan bên nîşandan. Têkoşîna me ya li dijî dargirkeran dê bidome." *HESEKÊ*

Meşa jinên ciwan a bi erbaneyan

Jinên Ciwan ên Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî di çarçoveya çalakiyên ji bo rakirina tecrîda giran a li ser Ocalan meşeke bi erbaneyan li dar xistin. Meşê ji Saziya Ciwanan a Wargehê dest pê kir heta ber Saziya Malbatên Şehîdan a wargehê dewam kir. Piştî ku jinên ciwan gihîştin ber Saziya Malbatên Şehîdan daxuyaniyek dan. Daxuyanî ji aliyê Rojîn Bayram ve hat xwendin.

Bayram diyar kir ku dê weke jinên ciwan li hemberî tecrîdê bêdeng nemînin û her dem di nava çalakiyan de bin û wiha got: "Rêberê me ji bo me jinên ciwan xeta sor e. Heta ku tecrîd li ser Rêberê me hebe divê tu kes di mala xwe de nesekine. Em ê weke jinên ciwan girêdana xwe ya bi Rêberê xwe re di nava çalakiyan de bidin nîşandan. Rêbertî ji bo me tê çi wateyê divê dost û dijmin her kes bibîne. Ji bo vê jî hewce ye tevahî jinên ciwan vê weke erka xwe ya herî sereke bigirin dest û tev li çalakiyan bibin."

Rojîn bal kişand ser êrîşên di rojên derbasbûyî de li ser wargehê pêk hat û wiha domand: "Dixwazin bi êrîşan gelê me bê vîn bihêlin. Lê bila baş bizanibin her diçe em jinên ciwan bihêztir dibin. Wê tu carî nikaribin bi êrîşan çavên me bitirsînin."

Hêjayî bibîrxistinê ye çalakiya greva birçîbûnê ku gelê wargehê li dijî tecrîdê li Saziya Malbatên Şehîdan dane destpêkirin di roja xwe ya 7'emîn de didome. *MEXMÛR*

'Azadiya Rêber Apo azadiya hemû jinan e'

Bi dirûşma 'Azadiya Rêber Apo azadiya mirovahiyê ye' Tevgera Kevana Zêrîn ji bo azadiya Ocalan û piştgirîdayîna çalakiya Leyla Guven şevbêrk li Şehbayê li dar xist. Gelê li Kampa Serdemê, endamên Kongreya Starê û Kevana Zêrîn, beşdarî şevbêrkê bûn. Di şevbêrkê de stranan ji bo Ocalan û azadiyê hatin gotin. Jinên ku beşdarî şevbêrkê bûn diyar kirin ku azadiya Ocalan azadiya jinan e.

Endama Tevgera Kevana Zêrîn a Herêma Efrînê Newroz Sulêman anî ziman ku we wek Kevana Zêrîn xwestin bi şeveke wiha balê bikişînin ser tecrîdê û bersivekê bidin dewleta tirk û wiha got: "Me bi şevbêrkê hezkirina xwe û têkoşîna xwe ya ji Rêberê xwe anî ziman. Stranên şoreşgeriyê û azadiyê bi dilekî germ hatin gotin."

Li dijî tecrîdê li ser pêya bin

Endama Rêveberiya Tevgera Kevana Zêrîn Mizgîn Çolaq anî ziman ku dê jinên kurd Ocalan azad bikin û got ku azadiya Ocalan azadiya hemû jinan e.

Di heman demê de endama Koordînasyona Kongreya Star a Navçeya Ehrezê Fatmê Sulêman jî ev tişt anî ziman: "Ji bo şikandina tecrîda li ser Rêber Apo em ê her tim li ser pêya bin. Tu carî bê azadiya Rêber Apo em azad najîn, heta ku Rêberê jinan Rêber Apo azad nebe em ê têkoşîna xwe bidomînin û piştgiriyê bidin berxwedana Leyla Guven." *ŞEHBA*

Li Fasê du jin ji aliyê DAIŞ'ê ve hatin qetilkirin

Jina bi navê Dane Louisa Jespersen (24) ku ji Danimarkayê ye û jina bi navê Maren Ueland (28) ku ew jî ji Norveçê ye li cihê turîstîk ê Marakeşa Fasê kamp ava kiribûn. Jinên ku kamp ava kiribûn ji aliyê komek DAIŞ'î ve pêşî hatin tecawizkirin û piştre bi îşkenceyê hatin qetilkirin. Piştî ku vîdeoya jinên ku hatin qetilkirin hat weşandin şûnde der barê bûyerê de 4 kes hatin binçavkirin. Îstixbarata Danimarkayê jî anî ziman ku ev bûyer ji aliyê DAIŞ'ê ve pêk hatiye. *RABAT*

www.arsiv.kurdi.org

Dê gel li deng û vîna xwe xwedî derkeve

CÛMALÎ DOGAN

Gelê Kurdistanê di hilbijartinên herîmê yên 2009 û 2014'an de serkeftinên girîng bi dest xistin. Ev serkeftin ji hejmara çendaniya şaredariyên bi dest xistin bêhtir; tevî hemû hîle, fişar,qedexe, gef û astengiyên dewleta TC'ê ya qirker, tercîha gel a ku ji sindoqan derket bû.

Niha jî dê gelên Kurdistan û Tirkiyeyê di hilbijartinên herêmî yên adara 2019'an de biçin ser sindoqan û tercîhên xwe bikin. Lê mercên hilbijartinên herêmî yên 2019'an, ji hilbijatrtinên 2009 û 2014'an cudatir in. Ev mercên niha bi tifaqa klîka faşîst a ku di 2015'an de ji aliyê AKP-MHP'ê ve bi hevpariyeke stratejîk bi 'Plana Islahata Şarqê'ya duyemîn a bi navê 'Plana Rûxandinê' li Kurdistanê bi êrîşên qirkirinê bi awayekî tund xistin meriyetê hatin avakirin. Ev jî dide xuyakirin ku dê hilbijartinên herêmî yên 2019'an ji yên beriya xwe di mercên cudatir de pêk werin.

Klîka faşît a AKP-MHP'ê ji niha ve amadekariyên vê kirine. Bi awayekî hevpar kîjan namzet li kîjan bajarî nîşan bidin diyar kirine. A rast ev mijarên teknîkî ji berê de diyar kirine û li gorî vê jî dest bi xebatên xwe kirine. Ji van girîngtir jî ji bo encamên ku ew dixwazin ji sinsoqan derbixin tiştên ku bikin diyar kirine û ketine nav liv û tevgerê. Ev jî ji girîngîpêdayîna klîka faşîst a AKP-MHP'ê ya ji bo hilbijartinên herêmî tê.

Faşîzma AKP-MHP'ê girîngiya rola hilbijartinên herêmî yên adara 2019'an ji bo diyarkirina dema mayîna xwe ya li ser desthilatê dibînin. Ji ber vê yekê jî bi armanca ku teqez bi ser bikevin ji berê de dest bi amadehiyan kirine. Daxuyaniyên R.T. Erdogan û Dewlet Bahçelî vê rastiyê piştrast dikin. Wek hilbijartinên berê niha jî gotina 'Pirsgirêka hebûna dewletê'bi kar tînin. Piştî ku van gotinan anîn ziman jixweber diyar dibe ku dê çi bikin. Gotina 'Wexta ku mijar hebûna dewletê be wekî din her tişt hûrgilî ne' jî dide xuyakirin ku her tiştî dikarin bikin. Bi van gotinên xwe dixwazin hişmendiyeke ku kes nikare li pêşiya wan bisekine di civakê de ava bikin, da ku bi vî awayî bigihîjin armancên xwe.

Ji ber vê ye ku çi gelê Kurdistanê, çi jî şoreşger û hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyê divê bibînin ku dê encamên van hilbijartinan ji yên din cudatir bin û divê amadekariyên xwe jî li gorî vê peywir û berpirsyariyê pêk bînin. Jixwe ne pêkan e mirov li benda dewleteke mîna TC'ê ya qirker, mêtinger û faşîst ku hilbijartineke herêmî ji bo xwe wek 'hebûnê'dibîne be ku helwesteke cuda nîşan bide.

Di vê mijarê de dikarin ji referanduma ku pêk hat û hilbijartinên berê encaman derbixin. Klîka faşîst a AKP-MHP'ê bi bikaranîna derfetên dewletê ji bo encamên dixwestin ji sindoqan derbixin çi ji destê wan hatibû kiribûn û gihîştibûn armanca xwe. Ev ji bo wan ne tenê qezenckirina hilbijartinekê bû. Û ev ji bo wan dihat wateya bêalternatîfbûna wan û bêçarehiştina gelên Kurdistan û Tirkiyeyê û bi vî awayî jî mewziyek din qezenc dikirin. Ji ber vê ye ku di ev hilbijartinên herêmî de jî dê hîle, gef, fişaran û hwd. zêdetir bikin û sepanên nû jî lê zêde bikin.

Lê belê divê mirov nebêje û nefikire ku faşîzma AKP-MHP'ê bi ev pêkanînên xwe yên di hilbijartinên herêmî de ew ê encamên ku dixwaze bi dest bixe. Jixwe faşîzma AKP-MHP'ê jî dixwaze di civakê di ser hêzên şoreşger, demokrasî û azadîxwaz û kesên ku li hemberî wan muxalefetê dikin de hişmediyeke ku 'Kes nikare li ber wan bisekine', 'Ji xeynî teslîmbûnê tu vebijêrkeke wan tune ye'biafirîne û bi vê yekê jî bandorekê li ser wan bike da ku li gorî daxwazên wê tevbegerin.

Wek ku berê jî hat kirin, niha jî dikare êrîşên şerê psikoljîk yên bi vî rengî yên faşîzma AKP-MHP'ê vala bên derxistin û nehêlin ku bigihîjin armancên xwe. Mercên vê hene û ku ji hilbijartinên berê dersên pêwîst bên derxistin ev pêkan e jî. Ji ber ku hilbijatinên herêmî ne û bi xwedîderketina gel a dengên xwe ku bendorê li encaman dike, derfet dide vê. Gel berê jî li dengê xwe xwedî derketibû; li hemberî encamên ku bi hîle û lîstikan derxistinbûn nepejirandibûn û bi vê nehiştibûn ku derewên wan bi ser bikevin. Di dawiyê de bi destê gel dad û maf bi pêk hatibûn. Dikarin di hilbijartinên herêmî yên adara 2019'yan de jî vê pêk bînin.

Partiyên kurd li hev kirin

Kadrî ESEN / AMED

Hilbijartinên herêmî yên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê dê di 31'ê Adara 2019'an pêk bên. Weke hilbijartinên giştî û serekkomariyê yên 24'ê hezîranê di vê hilbijartinê de jî AKP-MHP û CHP- ÎYÎ Partî li gelek bajaran bi tifaqê tev li hilbijartinan dibin. HDP jî bi armanca ku li bakurê Kurdistanê li dijî van tifaqan bi serkeve di meha cotmehê de bi partiyên kurd re dest bi hevdîtinan kir. Partiyên mîna HDP, DBP, Tevgera Azadî, Partiya Komunîst a Kurdistanê (KKP), Partiya Mirov û Azadiyê (PÎA) Partiya Demokrat a Kurdistanê-Bakur (PDK-B) û Partiya Demokrat a Kurdistanê-Tirkiye (PDK-T) beşdarî van hevdîtinan bûn.

Parlameterê HDP'ê yê Amedê Îmam Taşçier ku tev li van hevdîtinan bû têkildarî pêşveçûna hevdîtinan axivî û diyar kir ku bi partiyan re di mijara tifaqê de li hev kirine û dê di rojên pêş de di asta hevserok û serokên partiyan de cara dawîn hevdîtinek bê kirin û bi awayekî fermî tifaq bê ragihandin.

Tişta girîng sînerjî ye

Taşçier di berdewamê de got ku tişta girîng ji bo wan sînerjiya tifaqê ye û ev tişt anîn ziman: "Her partî dê li gorî hêza xwe di tifaqê de bê temsîlkirin. Hevşaredar jî di nav de li gorî daxwaza partiyên navborî cîgirtiya hevşaredar û endamên meclisê ji wan re bên veqetandin."

Taşçier got ku teklîfa tifaqê ji HAK-PAR, PAK û PSK'ê re jî birine û wiha axivî: "HAK-PAR'ê deriyê xwe ji teklîfa me re girt û bi tu awayî bersiv neda teklîfa me. PAK û PSK'ê jî diyar kirin ku dê ew jî bi namzetên serbixwe tev li hilbijartinê bibin."

Dengê lawazbûna AKP'ê

Her wiha Taşçier der barê tifaqên muhtemel ên ku partiya wan li aliyê Tirkiyeyê pêk bîne jî axivî û diyar kir ku ji bo lewazbûna AKP'ê ji bilî ÎYÎ Partiyê di navbera wan û gelek partiyan de ji bo tifaqê hevdîtin pêk hatine û axaftina xwe wiha bidawî kir: "Hevserok û em parlamenter tev li van hevdîtinan nebûn. Hevdîtin di asta rêveberiyên partiyan de pêk hatine. Li aliyê Tirkiyeyê li şûna namzetan em ê dengê xwe bidin lawazbûna AKP'ê. Heke AKP lawaz nebe dê di pêşerojê de li hemberî kurdan polîtîkayên dijwartir bike meriyetê. Ji ber vê sedemê dibe ku hilbijarên me ji bo lawazbûna AKP'ê wek bersiv dengê xwe bidin hin namzetan li dijî AKP'ê."

Komên nû dest bi grevê dikin

Li ser navê girtiyên PKK û PAJK'ê Denîz Kaya daxuyaniyeke nivîskî da û diyar kir ku tu pergal nikare Ocalan teslîm bigire û da zanîn ku dê komên nû dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin

Denîz Kaya li ser navê girtiyên ji doza PKK'ê û PAJK'ê yên li girtîgehên bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê girtî ne daxuyanî da û diyar kir ku çalakiya greva birçîbûnê ya di 16'ê kanûnê de hatiye destpêkirin di roja 7'emîn de didome.

Kaya bi bîr xist ku tecrîdkirina Ocalan 3 sal li pey xwe hişt û wiha got: "Gelê Kurdistanê û raya giştî ya cîhanê têkildarî Rêber Apo agahiyek nikare bigire. Em jî dixwazin hîn bibin ka Rêber Apo dijî yan najî! Em nizanin li pergala îşkenceya Îmraliyê çi diqewime. Dewleta tirk dixwaze bi tecrîdkirin û îşkencekirina di şexsê Rêberiya me de tevahiya gelê me teslîm bigire."

Çalakî bi biryardarî didome

Kaya ragihand ku dê komên nû dest bi çalakiyên greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin û ev tişt ragihand: "42 hevalên me li girtîgehên tîpên cuda yên Gebze, Kandira, Panos, Wan, Xarpêt, Beşîkduzu, Bakirkoy û Amedê di 16'ê kanûnê de dest bi çalakiyên greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kirin û ev çalakî bi biryadariyeke mezin didome. Di vê çarçoveyê de di rojên pêş me de komên nû jî dê beşdarî çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bibin. Koma duyem ên beşdarî çalakiyê bibin ji Girtîgeha Silîvrî, Girtîgeha Tîpa F Jimara 1 a Tekîrdag, Girtîgeha Jinan Jimara 2'an a Şakranê, Girtîgeha Odemîş û Girtîgeha Kirikkale pêk tên. Dê li van girtîgehan di 26'ê kanûnê de çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger bên destpêkirin. Koma sêyemîn jî dê li Girtîgeha Bandirma, Girtîgeha Alanya, Girtîgeha Kayserî, Girtîgeha Tarsûsê, Girtîgeha Tokatê Girtîgehên Hîlwan û Siwêregê çalakiya greva birçîbûnê ya bêdawî û bêdorveger di 5'ê çileya 2019'an de dest pê bikin."

Kes nikare Ocalan teslîm bigire

Her wiha Kaya daxuyaniyê wiha bi dawî kir: "Dema daxwazên me neyên bersivandin, çi tişta biqewime em berspirsyariya wê qebûl nakin. Tu pergal a îşkence û tecrîdê nikare Rêber Apo teslîm bigire. Teqez û teqez dê gelê me bi ser bikeve û siyaseta mêtingeriyê jî têk biçe. Em bang li gelê xwe yê welatparêz dikin di serî de bi serhildan û bi her cureyî destekê bide çalakiyan û hemû raya giştî ya demorkatîk jî vedixwînin hestiyariyê."

'Giyanê zindanê zindî bû'

Girtiyên PAJK'ê yên li Girtîgeha Tîpa E'yê ya Amedê jî têkilî grevên birçîbûnê peyamek dan û ragihandin ku zindana Amedê êrîşên wek vê beriya 40 salî bi giyanê berxwedanê yên Kemal, Xeyrî û Sakîneyan hatiye pûçkirin û wiha gotin: "Niha jî giyanê berxwedanê yê zindanê yê PKK'ê zindî bûye, li serkeftina teqez asê bûye. Em girtiyên jin ên PAJK'ê bi biryar û bi wê îdiayê ne ku peywir û berpirsyariya ku serdemê daye ser me bi cih bînin." *AMED*

Azadiya Ocalan daxwaza bingehîn e

Çalakiyên greva birçîbûnê yên ji bo şikandina tecrîdê li seranserê Kurdistan û derveyê welat didomin.

Di vê çarçoveyê de çalakiya greva birçîbûnê ya ku bi pêşengiya nûnertiya HDP'ê ya Hewlêrê hatiye destpêkirin, di roja 32'yemîn de ji aliyê koma 17'emîn ve didome.

Bi heman armancî çalakiya ku Komeleya Karkerên Mezopotamayayê ya li Silêmaniyêyê 9 roj berê hatibû destpêkirin, ji aliyê jinên bakurê Kurdistanê ve dewam dike û her wiha komek endamên RJAK'ê jî tev li çalakiyê bûn.

Li Şengalê ciwanên êzidî di bin pêşengtiya Yekitiya Ciwanên Êzidî (YCÊ) û Yekitiya Jinên Ciwan (YJÊ) de ji bo azadiya Ocalan meşiyan û tecrîdê şermezar kirin.

Ji aliyê din ve greva birçîbûnê ya ku li navçeya Erşov a bajarê Saratovê yê Rûsyayê bi pêşengiya Otonomiya Çanda Kurd a Erşovê bi awayekî dorveger destpêkir, ji aliyê Komîteya Ciwanan didome. Di çalakiyê de ciwanan diyar kir ku bidawîbûna tecrîdî û azadiya Ocalan daxwaza bingehîn a gelê kurd e.

Her wiha li bajarê Solothûrn ê Swîsreyê jî ji aliyê ciwanên çep-sosyalîst ên Swîsreyê û Civaka Demokratîk a Kurd ve çalakî pêk hat. *AMED*

'Em ê xwe biparêzin'

Hevserokê Komîteya Têkiliyên Dîplomatîk a PYD'ê Salih Muslim biryara DYA'yê ya vekişîna ji Sûriyeyê nirxand û got ku ew bi biryar in ku li dijî hemû êrîşan gelê xwe biparêzin.

Muslim anî ziman ku koalîsyona navneteweyî li ser banga wan nehatiye, lewma jî dê ji wan re nebêjin 'biçin' û wiha dom kir: "Ji xwe ew ji bo parastina me nehatibûn. Em pişta xwe dispêrin xweparastin û hêza xwe. Em xwe bi rengekî rewa diparêzin. Me tu carî ev yek lawaz nekir. Man an jî neman, ew biryara wan e. Berjewendiyên me li hev kirin û em bi hev re tevgeriyan. Lê me tu carî pişta xwe bi wan negirt."

Di axaftina xwe de Muslum bal kişand ser gefên Erdogan ên dagirkirinê û got ku amadekariyên dewleta tirk a ji bo dagirkirina bakurê Sûriyeyê û biryara Amerîkayê ya vekişînê teqez bi hev re pêwendîdar in.

Muslum da zanîn ku konjoktur tevlihev e û got ku çawa her kes xwedî berjewendî ye û xwe difikire ew jî berjewendiya gelê xwe difikire, ji ber vê dikarin bi her kesî re bikevin diyalogê . *QAMIŞLO*

Gef û êrîş li dijî hemû kurdan îlan şer e

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan bû mêvanê bernameya taybet a Stêrk TV û têkildarî geşedanên dawî axivî.

Karayilan bal kişand ser gef û erîşên li dijî rojavayê Kurdistanê û wiha got: "Hem ji aliyê siyasî hem jî ji aliyê leşkerî ve êrîşa li ser rojhilatê Firatê ji bo rejîma Enqereyê ya faşîst xwedî gelek zehmetiyan e. Gefên tên xwarin, îlana şer e li dijî kurdan e. Ev sê sal in em tînin ziman. Bi hêzên derveyî xwe bi taybet jî bi rayedarên başûrê Kurdistanê re parve dikin. Êdî konsepteke nû ya dewleta tirk heye. AKP-MHP-Ergenekon û neteweperestan tifaq çêkir û li gorî vê konseptê tevdigerin. Li gorî vê ne tenê li sînorê Tirkiyeyê, li derveyî sînor jî êrîş li kurdan bê kirin, bên dagirkirin û kontrolkirin. Tenê armancake vê konseptê heye, ew jî divê kurd nebin xwedî statû. Her wiha dê şerê li Rojhilata Navîn bi dizayneke nû biqede û divê kurd di vê dizaynê de cih bigirin."

Her wiha Karayilan da zanîn ku divê li ser aliyên siyasî, dîplomatîk û şer baş bê sekinandin û wiha bi dawî kir: "Dema ku şer dest pê kir divê dîplomasî û siyaset jî bi xurtî bê kirin. Yek taybetmendiya girîng jî rola gelê xwecihî ye. Temamiya gelê li Efrînê welatparêz bû lê belê di nava şer de nehate birêxistinkirin û li Efrînê kom bûn. Ev yek şaş bû. Divê herkes li gundê xwe, li bajarokê xwe be û bibe mertalên zindî. Ji bo serketina şervanan çi ji destê wan tê divê bikin. Şervan jî divê bersiva vê yekê bidin." *BEHDÎNAN*

www.arsivakurd.org

Kana komirê teqiya 5 kesan jiyana xwe ji dest da

QUDS - Hat ragihandin ku li welatê Çekyayê di encama teqîn û herifîna kaneke komirê de, 5 karkeran jiyana xwe ji dest daye û ji bo rizgarkirina 8 karkeran jî xebat tên kirin. Li gor zanyariyan teqîn di kana komirê ya şîrketa OKD'ê de ku li bajarê Karvîna yê Çekyayê ye pêk hatiye . Hat zanîn, cenazeyên 5 kesan û bêhtirî 10 birîndan ji kanê hatine derxistin, lê hîn lêgerîn ji bo 8 karkerên din berdewam dikin. Li gorî ragihandina herêmî sedema teqîna kana komirê gaza metanê ye.

Înterpol: Metirsiya terorê li Ewropayê heye

Bi gefên dewleta tirk ên ji bo dagirkirina Rojava re bala her kesî çû ser çeteyên DAIŞ'iyên biyanî yên di destê YPG'ê de. Li gorî medyaya welatên rojava, bi êrîşa dewleta tirk re dibe ku kaosek derkeve û DAIŞ'î yekser xwe bigihînin Ewropayê. Ev jî ji bo welatên Ewropayê metirsiyek e

Çeteyên DAIŞ'ê yên welatiyên welatên rojava, ev demek bû di rojeva Ewropayê de bûn. Bi taybetî ji bo 35 welatiyên alman ên DAIŞ'î yên bi saxî ji aliyê YPG'ê ve hatin girtin, bang li Hikûmeta Federal a Almanyayê dihate kirin. Rêveberiya Berlînê jî ji bo anîna welatiyên xwe ji bo Almanyayê li ser alternatîfan dixebitî.

Hêzên navneteweyî beriya niha gotibûn ku ew ne alîgirê wê yekê ne ku ji bo DAIŞ'iyên dîlgirtî dadgeha sûcên şer bê avakirin. Lê belê, bi gefên serokkomarê tirk Tayyîp Erdogan ên ji bo dagirkirina Rojava û bakurê Sûriyeyê û biryara rêveberiya DYA'yê ya ji bo vekişîna leşkerên xwe ji herêmê, aqûbeta

DAIŞ'iyên di destê YPG'ê de, careke din bûn mijara guftûgoyan.

Di nûçe/analîzên medyaya welatên rojava de hate ragihandin ku DAIŞ'iyên hemwelatiyên welatên Ewropayê dikarin xwe bigihînin Ewropayê û rewşeke bi vî rengî wê metirsiyeke mezin be li ser ewlekariyê.

Daxuyaniya Hevserokê Desteya Têkiliyên Derve ya Kantona Cizîrê Dr. Abdulkerîm Omer a li ser vê mijarê, cihekî berfireh di ajansên nûçeyan ên welatên rojava de girt. Yek ji rojnameyên sereke yên Almanyayê FAZ û qenala nûçeyan N-TV ev mijar bi sernavê "DAIŞ'î dikarin vegerin welatên xwe" ragihandin.

800 DAIŞ'î ewropî ne

Rêveberiya Berlînê meha mijdarê bersiv dabû pêşnûmapirseke Partiya Çep û diyar kiribû ku ji bo anîna Almanyayê ya çeteyên DAIŞ'ê yên welatiyên Almanyayê yên di destê YPG'ê de, ew hemû alternatîfan lêkolîn dikin. Di medyayê de hatibû weşandin ku serdozgeriya federal der barê 14 DAIŞ'iyên Alman ên di destê YPG'ê de, lêpirsîn hatiye vekirin.

Di operasyonên yekîneyên taybet ên YPG'ê de 2700 DAIŞ'î hatin girtin û niha li girtîgehên li rojavayê Kurdistanê ne. 800 ji vana jî ji 46 welatên biyanî ne ku piraniya wan welatên rojavayî ne. Rêveberiya Rojava bi taybetî bang li DYA, Fransa û Almanyayê kiribû ku bikevin dewrê û ji bo darizandina DAIŞ'iyên biyanî bi berpirsyarî rabin. Tê texmînkirin ku tenê ji Almanyayê zêdeyî hezar kes li Sûriye û Iraqê tev li DAIŞ'ê bûne.

Pêla duyemîn a terora DAIŞ'ê

Sekreterê Giştî yê Înterpolê Jurgen Stock duh li paytexta Fransa Parîsê daxuyaniyek da û diyar kir, li welatên Ewropayê dibe ku pêla duyemîn a terora DAIŞ'ê rû bide. Stock diyar kir, çalakiyên terorê yên gengaz dikare bi navê "ISIS 2.0" (DAIŞ 2.0) were binavkirin û got, gelek alîgirên DAIŞ'ê ji ber ku êrîşeke berbiçav nekirine ji bo demeke kin hatine girtin û wê di nava çend salan de bên berdan. ***BRUKSEL***

Wezîrê Parastinê yê DYA'yê Mattîs îstifa kir

Wezîrê Parastinê yê DYA'yê Jîm Mattîs diyar kir ku wî û serokê Amerîkayê Donald Trump li hev nekirine û îstifa kiriye. Nameya ku Jîm Mattîs ji serokê DYA'yê Donald Trump re nivîsî, ji aliyê Pentagonê ve hate weşandin.

Mattîs got, "Mafê we ye ku hûn xwedî wezîrekî parastinê bin ku nêrînên wî û di hin mijarên din de hîn bêhtir nêzî nêrînên we be. Ji ber vê yekê, bi dîtina min a herî rast ji bo min; vekişîne."

Îstifaya Mattîs piştî biryara serokê DYA'yê Donald Trump a vekişîna ji Sûriyeyê pêk hat. Wezîrê Parastinê Mattîs li dijî vekişîna ji Sûriyeyê bû.

Rayedarekî payebilind ê Qesra Spî ji Reutersê re ragihand ku Trump û

Mattîs roja pêncşemê li hev rûniştine û li ser hin mijaran li hev nekirine. Beriya ku Mattîs îstifaya xwe aşkera bike, Trump bi rêya Twîtterê ragihandibû ku wê Mattîs dawiya meha sibatê dev ji peywira xwe berde û wê wezîrekî nû li şûna wî tayîn bike.

Mattîs di sala 2016'an de ji bo Pentagonê hatibû peywirdarkirin. Di sala 1991'î de di dema şerê Kendavê de fermandarê tabûrekê bû. Di sala 2001'î li Afganistanê fermandarê hêzên taybet bû. Di sala 2003'yan de dema dagirkirina Iraqê bi rola diyarker rabû û di şerê Fellûceyê de fermandarê leşkerên peya yên deryayê bû. Mattîs ku di sala 2013'yan peywira Fermandariya Hêzên Navendî ya DYA'yê (CENTCOM) bi cih anî, polîtîkayên serokê wê demê Barack Obama yên Rojhilata Navîn bi rengekî vekirî rexne kiribûn. Rexneyên herî giran ên Mattîs li ser Îranê bûn. Mattîs, Îran weke metirsiya herî mayînde ya li Rojhilata Navîn bi nav dikir. ***WASHÎNGTON***

Fransa: Hîn metirsiya ewlehiyê bi dawî nebûye

Wezareta Karên Derve ya Fransayê piştî gefên Tirkiyeyê yên li dijî gelên bakurê Sûriye û rojavayê Kurdistanê û di heman demê de biryara DYA'yê ya vekişîna ji Sûriyeyê daxuyaniyeke vîskî. Di daxuayiniyê de hat destnîşankir ku divê ewlekariya gelên bakur û rojhilatê Sûriye û HSD'ê misoger bibe.

Ji ber gefên dewleta tirk ên li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyeyê û herî dawî jî piştî biryara Trump a vekişîna hêzên amerîkî ji Sûriyeyê Wezareta Karên Derve ya Fransayê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Li gorî daxuyaniya li ser malpera fermî ya wezaretê hatiye parvekirin, biryara serokê dewletê DYA'yê Donald Trump wiha tê nirxandin: "Fransa têkoşîna li dijî DAIŞ'ê li pêşiya her tiştî digire. Têkoşîna li dijî gefên gerdûnî ya DAIŞ'ê hîn didome. Hîn jî DAIŞ weke gefekê li Rojhilata Navîn heye. Em di wê baweriyê de ne ku rêxistina terorîst bi taybetî li Sûriyeyê li ser parçeyek xaka biçûk hebûna xwe wê biparêze."

Di berdewama daxuyaniyê de hat diyarkirin ku divê ewlehiya hêzên li herêmê bê misorkerin û wiha hat gotin: "Ji sala 2014'an ve bi çalakiyên koalîsyonê yên navneteweyî li aliyekî bi hevkariya Iraqê û li aliyê din bi hevkariya kurd û erebên Sûriyeyê û bi hêzên herêmî re DAIŞ hate lewazkirin. Fransa di mijara parastin û misogerkirina ewlekariyê di serî de Hêzên Sûriyeya Demokratîk hemû hevkarên DYA'yê li ber çavan digire. Parastina gelên bakurê û rojhilatê Sûriyeyê û di vê wateyê de aramî û ji bo pêknehatina êşên mezin û vegera terorîstan divê ji aliyê DYA'yê ve li ber çavan bên girtin." ***PARÎS***

Ji sala 1999'an û vir ve qelew û kiniktir in!

Li gorî statîstîkên tenduristiyê yên federal ên DYA'yê, amerîkî li gorî sala 1999'an qelew û kiniktir bûne. Daneyên ku hatin weşandin, li ser statîstîkên navbera salên 1999 û 2016'an de ne. Rapor bi navê "Natîonal Center for Health Statîstîcs" hate weşandin û tê de hate gotin ku hem jin, hem jî mêr di asteke bilind de qelew bûne. Lêkolîn li ser 47 hezar mirovên ji 20 salî mezintir hate kirin. Li gorî lêkolînê, di navbera salên 2015 û 2016'an de mêrên amerîkî li dora 89,8 kg, jinên amerîkî jî li dora 77 kg bûn. Di navbera salên 1999-2000'î de mêr 86 kg, jin jî li dora 74 kg bûn. Di navbera salên 2015-2016'an de bejna amerîkiyan li dora 175,5 cm bû, di navbera salên 1999-2000'î de li dora 175,6 cm bû. Bejna jinên amerîkî jî ji 162,1 cm daket 161,7 cm'yî. ***WASHÎNGTON***

Amerîka xwe ji Afganistanê vedikişîne

Tê îdiakirin ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) piştî biryara vekişîna ji Sûriyeyê, hejmara leşkerên xwe yên li Afganistanê jî wê kêm bike. Li gorî nûçeyeke Euronews (farisî) ku xwe dispêre agahiyên rayedarekî amerîkî, serokê Amerîkayê Donald Trump biryar daye ku rêjeya leşkerên Amerîkayê yên li Afganistanê jî kêm bike.

Têkildarî dem û şêwaza vekişînê tu zanyariyek din nehatiye parvekirin. Di 11'ê mijdara 2001'î de DYA û Hêzên Hevpeymaniyê Afganistan dagir kirin û rejîma Talîbanê rûxandin. Hejmara leşkerên Amerîkayê yên li Afganistanê 14 hezar e. Piştî 17 salan hîn jî Afganistan rastî êrîşên Talîbanê tê û rojane welatiyê afgan tên qetilkirin.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku beriya niha bi 2 rojan danûstandinên aştiya Afganistanê ya di navbera nûnerên Talîba-Pakîstan-Erebistana Siûdî-Îmarat-Amerîkayê de bi dawî bûn. Lê nûnerên Talîbanê danûstandinên li gel nûnerên dewleta Afganistanê qebûl nekirin. ***KABÛL***

Ewropa ji awayê birêvebirina Brexîtê aciz e

Ji ber ku danûstandinên li ser derketina Brîtanyaya Mezin a ji nava Yekitiya Ewropayê (Brexît) li derveyî Parlamentoya Ewropayê tên kirin, parlamento ji vê yekê gelek aciz e.

Serokê Parlamentoya Ewropayê Antonîo Tajanî ji Serokwezîrê Awûstûryayê Sebastîan Kûrz ku serokê demê yê Konseya Yekitiya Ewropayê ye, nameyek şand. Tajanî bi bîr xist ku li gel Parlamentoya Brîtanyayê, peymana Brexîtê wê li Parlamentoya Ewropayê jî pêşkêşî dengdanê were kirin û hişyarî da ku dikarin peymanê bloke bikin.

Li gorî nûçeya kovara Der Spîegelê, Tajanî nerazîbûn nîşan daye ji ber ku heta niha di danûstandinan de û ji aliyê bicihanîna peymana Brexîtê de rol ji Parlamentoya Ewropayê re nehatiye dayîn.

Tê gotin ku gelek komên partiyan ên li Parlamentoya Ewropayê li dij in ku parlamento tenê weke cihê dengdana peymanê tê dîtin. Her wiha tê gotin ku Parlamentoya Ewropayê ji rola Komîteya Brexîtê jî aciz e ku ji bo bicihanîna peymana Brexîtê bişopîne hatiye avakirin. ***STRASBOÛRG***

www.arsivkurdi.org

Kirmanckî
22 Kanûne 2018 Şeme

Hemserekê HDP û DBPyî yê Wanî ameyî destbendkerdene

WAN - Wan de sereştişê polîsan de hemserekanê HDP û DBPyî û 2 Mayanê Aşitîye ya pîya xeylî tenî ameyî destbendkerdene. Wan de saetanê sibayî de polîsan eşt keyeyan ser, hemserekê HDPyî yê bajarî Umît Dede, hemserekê DBPyî yê bajarî Okkeş Kawa, îdarekara HDPyî Handan Karakoyune, hemsereka HDPyî ya qezaya Payîzava Sînem Malale, endamê Melîsê Mayê Aşitîye Xemê Akdogane û Cahîde Olmeze destbend kerdî. Ame vatene ke sebebê destbendkerdişan protestokerdişê hêrişê serê Mexmûr û Şengalî yo.

Qayûm şaredarî açarna qereqol

Badê ke qayûm tayînê Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî bî, şaredarî bedilîya qereqol. 2 serran de her yew personelêk tewrê kêmî hezar û 132 reye nuqtayê cigêrayîşî ra ameyî derbazkerdiş. Goreyê proseduran, ganî badê namzedî Atîlla îstifa bikerdêne

11ê êlula 2016î de qayûm tayînê 24ê ci yê Partîya Herêmê Demokratîkî (DBP) pêropîya 28 şaredarîyan ameyî kerdiş. Badê çend aşman qayûmî tayînê 96 şaredarîyanê DBPyî kerdî. Tayînkerdişê qayûmê Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî ra dima, 1ê teşrîna peyêna 2016î de Hemserekê Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî Gulten Kişanak û Firat Anliyî ke qayûm tayînê herinda înan bibi, ameyî tewqîfkerdiş. Tewqîfkerdişê hemşaerdaran ra dima Qeymeqamê Etîmesguta Anqara Cumalî Atîlla sey qayûm tayînê şaredarî bibî.

Tayînkerdişê qayûmî ra dima polîtîkayê xizmetî yê şaredarî bedilîyayî. Qayûm tebelayanê zafxizmetî ard war û herinda înan de xizmetê yewziwanî aliqna. Sewbîna nameyê parkan yê kurdî bedilna, kreşê ke perwerdeyîya kurdî dayêne û komeleyê cinîyan pada. Badê ke qayûm tayînê Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî bî, şaredarî bedilîya qereqol. Dormeyê şaredarî bi barîyerê polîsan piştî û quleyê polîsan viraştî. Mîyanê şaredarî zî kêmê rewşa teber nîyo. Qato ke qayûm ci de maneno bi polîsanê sivîl û taybetan debîyo û heme qatê şaredarî de polîsî ameyî cakerdiş. Polîsî heme têgêrayîşê personelan taqîp kenî.

Şaredarî nîyo sey edlîye yo

Polîsê taybet ge-ge bi çekanê luledergan pêroyê awanî û odeyan gêrenî û xeylê tablo û vilikê ke ode û salonê awanî de yî bi mehneya 'beno ke tehlukeyin bibo' vejenî teber. Badê yew serrî qayûm barîyerê polîsan yê ke dormeyê awanî de bî wedarna û herinda înan de vildanê vilikan rona. Personelê şaredarî wexto ke kewenî awanî haletê X-Rayî ra derbaz benî. Personelî derbazbîyayîşê X.Rayî de timî kamîya xo nîşan danî û qayîş û saetê xo vejenî. Sewbîna personelî sere de nuqtaya teberê şaredarî ra yenî derbazkerdiş û dima ra mîyanê şaredarî de yenî cigêrayîş. Roja tayînkerdişê qayûmî ra heta nika her yew personelêk tewr kêmî hezar û 132 reyan ameyî kontrolkerdiş. Na rewşe seba hemwelatîyanê ke şonê şaredarî zî derbazdar a. Êdî hemwelatî nêzanê ke kam edlîye yo û kam şaredarî yo.

Qayûm tabelayê şaredarî ke ser de Amed nuştêne wedar na û tabela ra Amed ame vetiş. Herinda Amedî de 'TC' ame nuştiş. Serekê Pêroyî yê AKPyî Tayyîp Erdogan qayûm Atîlla seba weçînayîşê herêmî ke do 31ê adara 2019î de pê bêro kerd namzedê Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî. Goreyê proseduran, ganî badê namzedî Atîlla îstifa bikerdêne, la hema zî wezîfe ser de yo. ***AMED***

Yê ke tayîn kenê zî baş nêweçînenî

Badê îlankerdişê OHALî binpaykerdişê heqan xeylê zêdîyayî. No prosesî de bi se hezaran kes karê xo ra bî. 102 şaredarîyê Partîya Herêmê Demokratîkî (DBP) ra 96ê ci hetê qayûmî ra ameyî dagirkerdiş û 50 hemşaredarî zî ameyî tewqîfkerdiş. Badê tayînkerdişê qayûman xeylê proje û xebatî ameyî betalkerdiş. 2016î ra heta nika 3 qayûm tayînê şaredarîya Farqînî ameyî kerdiş.

Babete ser o Raîfe Çelîka ke Farqîn de cuyena û Emîneye qisey kerdî.

Cinîyî qiseykerdişê xo de qala cardişê qayûmî kerdî û wina vatî: "Yê ke tayîn kenê zî baş nêweçînenî. Nê kesî do senî ma rê şaredartî bikerê? Bi aşman o ti xebatêk nîna meşnayîş. Reya yewina ke ma Farqîn wina vînenî. Heme ca mîyanê çamir de yo. Ma nêeşkenê domanan bieşrawê teber. Qayûm çîyêke nêkerdo. Rayîrê dewan xirabe yî. Ma tersenê ke qeza bibo. Borîyê dewe teqênê, ma telefon kenê pere wazenê. Do nika senî bêrê verê berê ma rayan biwazê." ***AMED***

Qala 35 serrê xo yê mîyanê çar dêsan kerd

Gulbaharî, serra 1981î de hema 19 serrîya xo de bi îdîaya 'endamîya TÎKKO' ame tewqîfkerdiş û cezaya muebetî dîya ci. La badê ke Mehkemaya Qanûn Bingeyî derheqê ci de qerarê 'binpaykerdişê heq' daye, ê kanûne de Zindanê Tekirdagî ra serbest vera dîya. Gulbaharî 1981î ra nata zindan de yo û 35 serrê emrê xo zindan de derbaz kerd. Gulbaharo 59 serrî rayapêroyî de sey hepsîyo tewr kehen yê derbeya 12. Êlule yeno şinasnayîş. Hasan Gulbaharî qala serranê xo yê mîyanê çar dêsan kerd.

Gulbahar wina dest bi qiseykerdişê xo kerd: "Ferzkerdişê yewtîpî 1983î de dest pêkerd û dima ra şert û mercê zindanan giran bî. Rewşa îstîsnayî de zindananê Metrîs, Mamak û Amedî de polîtîkayê taybet ameyêne meşnayîş. Helbet zindananê bînan de zî rewşe eynî bî. Binpaykerdişê heqanî her tewir astengî, qedexe û caardişî ameyêne kerdiş. Têkoşînê hemverê faşîzmî xurt bî û zindananê leşkerîyan de hêriş, teslîmgirewtiş û pelçiqnayîş estî. Bi xoverdayîş cewabê nê caradişan ameyêne dayîş. Cayê ke binpaykerdiş zêde bî de têkoşîn xurt bî. Tewr zêde heqê hepsîyê nêweşan ameyêne werdiş. Doktor 3 aşman de reyêk ewnîyayêne ma. Wirdî destê embazê ma Kemal Aktaşî çin bî. 4 raporê Kemal Ozelmaliyî esto ke ganî zindan de nêmano. Sewbîna Dayika. Tepiştişê înan wijdanî nîyo."

Gulbaharî tewr peynî bale ant şert û mercê zindanan yê xiraban ke hepsîyî bi rojeyê mergî xover dayî û mergê çalakgeran tewr zêde hukmato sivîl de bîyo ser. Gulbaharî qiseykerdişê xo yê peyênan de qala çalakîya vêşanîye ke seba wedarnayîşê tecrîdo girankerde ke Rayberê PKKyî Abdullah Ocalanî ser o yeno meşnayene kerd û va: "Na çalakîye talebê şaro ke wazeno senî bicuya ya. Şar piştî dano grevê vêşanîye. No waştişêko demokratîk o û ganî bêro qebulkerdiş." ***MÊRSÎN***

Ganî piştî bidîyo heme kedkaranê dinya

Çalakîya Kesê 'Yelegzerdinan' ke Fransa de bi amancê protesto kerdişê bêedaletîya sosyale, bicaardişê polîtîkayanê ekonomîye yê xeletan yê hukmatî dîya destpêekrdene û badê reaksîyonan bedilîya hêrsê hemverê serokomar Emmanuel Macronî. Çalakîye bedilîya protestokerdişê tewr şîdetin yê welate. Çalakîya 'Yelegzerdinan' teberê sînorî derbaz kerde û tesîrê xo daye pêroyê cihan ser. Derheqê babete de Sekretera Cinîyan ya MYKê Egîtîm Senî Derya Yulcu, Helîn Karakuşa ke piştî dana mîtîngê KESKî û Dîlay Vurale qisey kerdî.

Yulcuye qiseykerdişê xo de wina va: "Bedelê krîzî kedkar nê, ganî kesê ke awan kerdî bidî. Ma xeylê bajaran de vengê xo danî eşnawitiş. Ma veng danê heme kesan ke hemverê binpaykerdişê kede de bibî yew. Hewl danî faturaya krîzî kedkaran rê bibinî. Talebê Fransa û yê Tirkîye meşru yî."

Nêwazenî vengê ma bieşnawî

Helîn Karakuş û Dîlay Vurale zî qiseykerdişê xo de wina vatî: "Welat de krîzêko cidî esto. Hukmat bi bac û zemê ke şarî rê keno, hewl dano ke îqtîdarîya xo dewam bikero. Bi serran o ma heme raşteyan de hemverê binpaykedişê kede de qîrenî. La hukmat nêwazeno ke vengê ma bieşnawo. Çalakîya Yelegzerdinan heqdar û meşru ya. Binpaykedişê kede problemê heme dinya yo. Ganî piştî bidîyo heme kedkaranê dinya. Ma do heta peynî talemanê xo bîyarî ziwan." ***AMED***

Qezencê şarê Sûrîye yeno hedefgirewtene

Derheqê tehdîdê Erdoganî yê serê Rojhelat û Vakurê Sûrîye de Endama Îdareyê Keyeyê Êzidîyan Cîhan Celeo şîrove kerde û daye zanayene ke hmeverê heme polîtîkayê qirkerdiş, îşgalkerdiş û çinkerdişan de ganî heme dinya serê lingan de biba. Seba ke nê polîtakayî zirar danê heme şarê dinya û şexsê şarê kurd de zirarêko pîl dîyeno heme şarê dinya.

Celeoye dîyar kerde ke dewleta tirkî her wext bi tehdîdê xo qezencê heme şarê Sûrîye hedef girewta û wina va: "Tirkîye bi polîtîkayê xo vera bêhuqûqî û bêmerdimayî her wext demokrasî hedef girewta. Her dem piştdayîşê çeteyê DAIŞî kerda. Bi tehdîdanê xo Erdogan reyna wazeno rih bido DAIŞ. La vera nê polîtîkayê lêşînan de vindertişêko zelal û yewîye muhîm î. Wexto ke kurd, ereb, suryan, aşûr, tirkmen û kurdê êzidî yê Sûrîye bibê yew do no zî bibo cewabo tewr xurt ê vera zîhnîyetê dagirkerî. Qezencê heme şarê Sûrîye hedef yenî girewtene." ***HESEKÊ***

Şefa û Suse yê Hecînî de pêkewtişê giranî

Çarçiwaya Hamleya Firtineyê Cizîre de mabênê şerwananê QSDyî û çeteyanê DAÎŞî de pêkewtişî dewam kenî. Çeteyanê DAIŞî rewşa xirabî ya heweyî sey firsetî şuxulna û hêrişê nuqteyanê Hêzê Sûrîyeya Demokratîke (HSD) yê Şefa û Suse yê pabesteyê Hecînî kerdî. Mabênê şerwananê HSDyî û çeteyan de pêkewtişê bişidetî yenî ciwîyayene.

Cepheyanê Şefa û Suse yê pabesteyê Hecînî de çeteyanê DAÎŞî rewşa xirabî ya heweyî sey firsetî şuxulna û bi desan wesayîtanê zirxinan hêrişê nuqteyanê QSDyî kerd. Şerwananê QSDyî cade cevabê înan da. Mabênê şerwananê QSDyî û çeteyan de pêkewtişê bişidetî yenî ciwîyayene. Goreyê zanayîşan pêkewtişan de xeylî çeteyî ameyî kiştene. ***DÊRA ZOR***

www.arsivkurdi.org

Di qada hunerê de çend jinên kurd 2

Kakşar OREMAR

Dengê wê şilik û nazik, bihêz û tije êş e. Xemla dengê wê enstrûmanek bi navê dutare ku ji hêlekê Banû dinale û ji hêla din jî dutar pê re dikale. Hemû orkestra û dutar bersiva dengê wê yê bilind didin

Dengê folklora Behdînanê: Fewziye Mihemed (1926 Gundê Seyîdava-1992 Bexda)

Fewziye Mihemed di sala 1926'an da li gundê Seyîdava li devera Doskiya li başûrê Kurdistanê hat dinê. Lê ew ji ber karê bavê xwe di zarokatiyê çû Mûsil û Bexdayê. Evîna stranên folklorî ji zarokatiyê bala Fewziyê kişandin ser xwe. Dema mezin jî bû zû zû diçe Kurdistanê ku stranên bav û kalan hîn bibe. Di nava şahî û dewatan da beşdarî dikir. Xwediyê dengekî xweş bû. Ji 1'ê nîsana 1944'an heya sala 1952'an di radyoya kurdî de li Bexdayê her hefteyê 30 heya 45 deqeyan şahiya stranên kurdî digêra. Piştre ew bi karsazekî re zewicî û stranbêjî jî terikand. 4 keç û kurekî wê hene. Fewziye Mihemed di dirêjahiya jiyana xwe ya hunerî da nêzî sed stranên gelêrî li radyoyê tomar kirin, lê niha tenê 15 stranên wê li arşîva radyoyê mane ku bi ser hev da 77 deqe ne. Di sala 1992'an de Fewziye li Bexdayê çû rehmetê. Fewziye Mihemed xwişka hunermenda navdar Gulbiharê ye. Ji stranên wê yên naskirî: Qumrî Serbalim Şîne, Lê Lê Êmo, Xeftanê, Dotmam, Girê Sîra Bi Sîr e û Lê Lê Megirî ne.

Xizmetkara rewşenbîr û hunermendên kurd: Elmas Xan Mihemed (1894 Dêrgul - 2'yê kanûna sala 1974'an Bexda)

Elmas Xan Mihemed di sala 1894'an da li gundê Dêrgulê li bakurê Kurdistanê hat dinê. Li gor gotina mamosta Kemal Reûf Mihemed ew di 1'ê adara sala 1945'an de çû radyoya kurdî ya li Bexdayê û heya 21'ê çileya 1952'an 73 şahî di radyoya kurdî da pêşkêş kirin. Elmas Xan heya mirina xwe li taxa bi navê Eldoiyîn li Bexdayê dijî. Ew xwediyê dengekî xweş bû û stranên folklorî yên herêma Botan û Behdînanê di radyoyê da tomar kirin. Stranên Elmas Xanê yên naskirî : Hey Nêrgiz, Lêlê Kinê, Hatim Besta Belekê, Dotmam û bi giştî mejiyê Elmas Xanê mîna xezîneya stranên kurdî yê folklorîk bû.

Elmas Xan jineke dewlemend bû ku bi efserekî îngilîz re zewicîbû. Ew dotmama Meryem Xan Ehmed bû. Wê ji hunera kurdî û hunermendên kurd pir hez dikir. Ji ber wê jî deriyê mala xwe mîna mêvanxane û zankoyekê ji bo hunermend, rewşenbîr û siyasetvanên kurd vekirî hiştibû.

Elmas Mihemed an jî Elmasa Kurdî sala 1974an li Bexdayê çû rehmetê û li goristana Elmenteket hat veşartin.

Dengê jinên kurmanc, dengê koçberî û xerîbiyê: Banû Şîrwanî: (1929 Gundê Welîava – 2003 Meşed)

Dengê wê şilik û nazik, bihêz û tije êş e. Xemla dengê wê enstrûmanek bi navê dutare ku ji hêlekê Banû dinale û ji hêla din jî dutar pêre dikale. Hemû orkestra û dutar bersiva dengê wê yê bilind didin. Ew stranbêja çend nifşane ku hê jî di bîra civakê de maye û lorîkên wê tên guhdarkirin: "Bi dil firîn, bi dil firîn lorîkê lor… / Her yek aliyekê digirin lorîkê…

Lor dekem ez lorîkê xwe / Xelk û xwedê ban(g) dekem gulnazikê xwe

Ez êsîr im min bikirin lorîkê lor

….

Banû Şîrwanî piştî Nene Qemeronî jina duyê ye ku di nava kurdên Xorasanê de wek stranbêj bi nav û deng in, lê Nene Qeneronî hê jî keseke bênav û nîşane û tenê di bîranîn û hevpeyvînên kesên mîna Sîma Bîna de navê wê tê bihîstin. Banû Şîrwanî ji kurdên Qoçanê û serboriya wê dişibe a Meryem Xan, Nesrîn Şêrwan û Eyşe Şanê. Wê ji zaroktiyê bi rêya bavê xwe dest bi strangotinê kiribû. Ew heza ji hunerê mîna şitila rihaneke sêdendk di dil û hisên wê de şîn û zindî ma û heta roja mirinê jî rengê xwe neguherî.

Navê yê rast Mahbanû Ebbasî û sala 1929 û li gor hinek jêderan jî li sala 1926'an li gundê Welîava (girêdayî Farûc û Qoçanê) di nava malbateke gundî û cotkar de hatiye dinê. Temenê wê 40 salî bû ku li radyoya Meşed dest bi strangotinê kir. Bavê wê Ebasqolî û dengbêjekî naskirî yê herêmê bû. Hê zarok bû ku dayîka xwe ji dest da û ev jî bû sedem ku pir caran babê wê yê hunerhez di dîwana giregirên herêmê de Mehbanû jî bixwe re bibe. Melek Husênxan yek ji wan kesan bû ku heza wî ji huner û çanda kurdî re bêsinor bû. Enstrûmana dutar lêdixist û li gundê Welîava hunermend û pehlewanên kurd dianîn ba hev û hurmeta wan tim li ber çav digirt.

Mamostayê dîrokzan û evîndarê ziman û çanda kurdî rêzdar Kelîmulah Tohîdî hevpeyvînek bi Banû Şîrwanî re çêkiriye û li wira ew wiha behsa jiyana xwe dike: "Hê 20 salî bûm ku ez li şivanekî kurd yê bi navê Elî Ekber Qehremanlo mehr kirim. Du sal piştre ew bi nexweşiya zerikê mir û ez bi kurê me yê du mehî re bi tenê hiştim. Salek piştre ku dilgirtî bûm min 15 serî pez, çêlekek û guhdirêjê xwe firotin û ji gund derketim. Min nedikarî li gund strana bibêjim û xelkê ji ber wê ku min stran gotine henekên xwe bi min dikirin û digotin; hê salek di ser mirina mêrê wê re derbas nebûye ku dîsa distirê."

Çîroka jiyana Banû dûr û dirêj e, lê wê sedan stranên din jî di arşîva radiyoya Meşhedê de tomar kirin. Hemû rojê guhdarên dengê wê ji radioyê re tel dikirin û name li pey hev dihatin ku stranên wê zêdetir bêne lêxistin. Dema Ferhdîba Pehlewî diçe Meşhedê ew bi kincên kurdî li hemberî wê distire û Şehbano wek xanima yekê ya welat ji deng û defa ku ew lê dixe pir hez dike. Ji rewşa jiyana wê dipirse û ew jî behsa kêmasiyên jiyana xwe dike.

Fereh Pehlewî 500 metre erd wek xelat pêşkêşî wê dike ku ji xwe re stargehekê ava bike, lê bi çêbûna şoreşa sala 1979'an re hinek xêrnexwaz wî erdî ji wê distînin.

Li pey hatina rejîma îslamî strîna jinan qedexe dibe û Banû Şîrwanî jî ji tirsa îdamê xwe wenda dike. Piştre hemû wisa dizanin ku ew miriye. Salên piştre hate zanîn ku ew sax, kurê wê Ekber zewicîbû û xwedî zarok bû û bi karê ajotina taksiyê debara jiyana malbata xwe dikir.

Banû Şîrwanî weke qehremana qada stran û awazên kurmancî li her derê dihate naskirin û hezkirin. Her kesî mafê wê binpê dikir, lê ew li ser piyê xwe sekinî û bû navdareke dîrokê ku hunera wê yê tim nav û dengê wê di hişê civakê de zindî bihêle.

Banû sala 2003'yan li Meşhedê çû rehmetê û heya sax bû strana xwe ya bi navê "newînî derdê cudayî" digot û hêsirên salên xweş û nexweş yên qedera xwe ya reş dirijandin.

Parêzvana stran û zimanê kurdî, keybanûya bê tac û text Eyşe Şan: (1938 Amed- 18.12.1996 Îzmîr)

Li ser qedera xwe tim bi gilî û gazinc bû. Dehan caran xweziya wê hindê kiribû ka çima hatiye dinê û tu xêr ji jiyanê nedîtiye. Ew Eyşe Şan bû ku di nava kurdan de zû hate naskirin. Yek ji wan hunermendên ku li dijî siyaseta çewt û asîmilasyona reş û hemû alî ya Kemalîstan li bakurê Kurdistanê mîna şêre jinekê li ber xwe da, Eyşe Şan bû. Bi dengê xwe yê şilik û nazik, bi wan kilamên xwe yên resen, gotina bav û kalan bi bîra me anî: "Şêr şêr e çi jin çi mêr e." Wê ev rastî di çax û serdemekê de da îspat kirin ku komara stemkar a Tirkiyeyê xewna ji holê rakirina gelê kurd bi rêya tunekirina hemû taybetmendiyên çandî yên kurdan deqideyekê ji serê xwe dernedixistin.

Eyşe Şan ku di nava civata kurdan de bi navên mîna Eyşana Kurd, Eyşe Şan, Eyşe Xan, Eyşana Osman, Eyşana Elî û Ayşa Şan tê naskirin di mijdara sala 1938'an de li bajarê Amedê hat dinê.

Dema ku dengbêjên kurd di mala bavê Eyşeyê de li dora hev diciviyan ew jî ji wan çaxên bi qîmet sûd werdigirt û bi heval û destexwişkên xwe re heya berê sibê li pişta deriyê dîwanxaneyê rûdinişt. Bi evînek kûr li dengê stranbêj û dengbêjên mêvan guhdarî dikirin. Salên piştre dema ku hinek dengbêjan stranên bavê wê baş nedigotin, wê qirar da ku ew bixwe bikeve ser rêya hunera bavê xwe yê dengxweş.

Naveroka stranên Eyşe Şanê ku aliyekê pênaseya wê ya civakî-siyasî jî didin xuyakirin, sê babetên civakî (Gelêrî, siyasî û bûyerên jiyana wê bi xwe) digirin ber xwe.

Cembeliyê Mîrê Hekariyê, Mem û Zînê, Lê Lê Bêmal, Zerî Heyran, Cemîle, Bêrîvanê, Koçerê, Lawikê Metînî, Meyro, Hesenîko, Derdê Hewiyê, Qederê Yar, Xerîbim Dayê, Werin Werin Pêşmerge ne, Newroz û Welatê Min Diyarbekir stranên Eyşe Şanê yê meşhûr in.

Sala 1979'an Eyşe Şan ku bi salan bi hesreta dîtina başûrê Kurdistanê bû, çû serdana kurdên vê perça Kurdistanê û bi germî ji aliyê kurdên hemû deverên başûrê Kurdistanê ve hat pêşwazîkirin. Li Bexda, Duhok, Kerkûk û Hewlêrê bi hunermendên mîna M. Arifê Cizîrî, Îsa Berwarî, Gulbihar, Tehsîn Teha, Resûl Gerdî, Tahir Tofîq, Nesrîn Şêrwan û gelek kesên din re derket ser dikê û bi hev re konser pêşkêşî gel kirin. Her wiha wê bi gelek kesayetî û hunermendên kurd re hevdîtin pêk anîn.

Hunermenda navdar Eyşe Şan di 18'ê kanûna 1996'an de piştî ku gelek salên dûr û dirêj ji ziman û hunera resen a gelê xwe yê bindest re xizmetek bêwestan kir, bi nexweşiya kanser (şirpenceyê) li nexweşxaneya bajarê Îzmîrê çû ber dilovaniya xwedê.

Strana jêr tabloyeke wê jiyanê ye ku Eyşe Şanê bixwe kişandiye:

Qederê

Were yar... Qederê yar
Qederê çer bikem mîna qederê xelkê tu ji min re nebûy yar
Te ez kirim peyakê rêdûrê westiyayî peyayê piyadar
Tu bûy siwarekî bi rim û bi mizreq
Li ser pişta sêwîxelqê bûy siwar
Yar yar yar qederê yar
Lê qederê... te goştê min helandî
Lê stûyê lingê min li xelkê dikî xiwar
Lê qederê te ji xwe re ez kirime tucar
Tu ji min re bû yî bazar
Te ez kirime tu carekî bilmez
Bi bazara xwe nizanim kirime zirar yar yar...
Lê qederê malikşewitiyê
Te ez kirime şivanekî yaqe bi qulavê (qirêj) ling bi gemar
Tu yê li dawiyê bûye gurekî
Siba tu birçiye har yar yar yar
Lê qederê tu rûniştî li çiya kevir û dar li min tînî
Stûyê min li xelkê dikî xwar yar yar yar
Yar yar yar qederê yar, yar yar...
Lê qederê... malik şewitiyê
Tu bû yî siwarekî te ez ê ji xwe re kirim
axakî xwe yê rûsar
Te li dawiyê ez kirim heqsizekî heqvêrmezê bêbextê sextekar yar yar...
lê qederê...
Heftxêrnedî bêbext û sextekar yar yar...
Lê qederê te paşî ez kirime qumarçiyekî
Bi destê xwe nizane mala xwe şewitandî, dilîze
Bi heft salan û dilîze bi qumar
Ay lê qederê ez ê nifirekê li te li te bikim
Bila gunehê min bibe marekî re şê tîremar
Bila li stûyê te bişide qederê bigere mêrge bi mêrge
Yayle bi yayle ji te nemîne war bi war yar yar yar...
Lê qederê... malikşewitiyê wele tirsim tu tim yaxa min bernadî
Te darê çuqûrê daye ser piyê min sêwiya xwedê
Li welêt derxistime malxerabê te ez gerandime war bi war yar, yar...
Ay lê qederê wele tirsa min ji wê tirsê
Tu yaxa min bernadî heya roka vê mirinê, kefen û sabûn û xwendina xoce qorîna tirbê kundala sar yar yar
qederê yar...

www.arsivekurdi.com